



Leş û Tendurustî




Pîst.. perjanê leşî ye

Pîst : Pîst texeyeka tenk û nema çemî ye, hemu leşê me dadipoşe û hundirê leşê me ji hetav û tozu bektiñya diparêze. Her çende têkroya sitûratîya pîstê me nêzikî du milimêtrane, lê senga pîstê mirovekê pêgehiştî digehe çar kîlograman jî.

Pîstê me ji sê texeyan pêktê:

1- Texeya serve: Ewtexeye ya em di bînin û ji şaneyên hûr pêktê û berdewam diguhurîne daye.

2- Texeya navîn: Ji dezîyên nerm û ziravên bi pêkve niwî-sayî pêktê û nermiyê didete pîstî û nahêle bi dirîyê.



3- Texeya hundrîn: Ji rûnî pêktê û leşê me ji dirba di parêze.

Pîstê me ji bilî ku leşê me ji toz û bektiñya diparêze, têhna leşê me jî xweş dike. Bo nimûne: dema me germ dibe, xweh me dide û bi rêka vê xwehdanê pileya germahîya leşê me tê xwarê. Xwehdan ji leşê me, bi rêka kunkên hûryên ku di pîstê me dane, derdikeve.





Mû û nînok:

Mû û nînok jî pişkekin jî pîstê me. Mû, jî bilî pehnikên desta û binê piya, bi hemu leşê me ve hene. Lê jî hemu ciha pitir bi ser û birî û mijîlankên me ve hene. Pirç serê me jî serma û germê diparêze. Birî û mijîlank çavan jî tozê xwehê diparêze, nînok jî serên tîyên me diparêzin.



Pîst xwe nû dîke..

Pirç û nînokên me berdewam dirêj dibin û em dibirîn. Şaneyên pîstê me jî berdewam dimirin û dikevin û hindek şaneyên nû cihê wan digirin. Salane nêzîkî çar kîlogramên şaneyên mirî jî leşê me dikevin.

Birîn:

Dema pîstê me didiriyê birîn çê dibe. Hîngî pîstê me şaneyên nû çê dîke û cihê yê pûçbuyî digre û hosa devê birînê digehe yêk.



"Boçî rengê pîstê hemu mirovan wekî yêk nîng?"

Maddeyekê qehweyî di şaneyên pîstê me da heye dibêjnê "mîlanîn" û ewe rengî dide pîstê me. Hîndî mîlanîn di şaneyên pîstî da pitir be dê rengê wî tarîtir



Boçî mirov li ber hetavê reş dibe?

Dema hetav li mirovî didee, pîstê me pitir mîlanînê çê dîke û rengê wî tarîtir lê dihêt.

Boçî pirç sipî dibe?

Dema mirov pîr dibe, mîlanîn di pîstê mirovî da kêmkê dibe û hîngê mû jî sipî dibin.

